

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



"ZAROK FÊKIYE MALANE"



HÊJE MÊJE, EMÊ NUHA ÇEND

ÇIROK Û MESELÊN XWE

Jİ WERE BÊJIN

KULÎLK

ROVİYÊ FENEK Û MİRİŞKA SOR (1)

Hebû mirışkek sor, ew di daristanekê û di pî-
nikek li ser darekê bi serê xwe dijîya.



Li nêzîka wê mirîşka sor Rovîyekî cêlik lê
gelekî fenek hebû. Ew ne bi tenê dijîya ,
Ew teva dîya xwe di şikeftekê de dima.Ro -
vîyê fenek dixwest wê mirîşka sor bigre û
buxwe.



Wî hemû fen û feqê xwe anî bîra xwe, ji bo
ku tevnekê ji mîrîşka belengaz re li darxîne,
ku wê bigre û buxwe.Ji ber ku Roviyê fenek
ji demek dirêj de bi dora wê diket,ku wê
bigre.Lê mirîşk jî gelek baqil bû û ew fir-
seta ne dida rovi.



Roj bi roj rovîyê çêlik mezin dibû, lê ji bo
ku wê mirîşka sor nedigirt, wilo jî jar dibû.
Rojekê rovîyê fenek ji dîya xwe re got:

-Sibê ezê wê mirîşka sor bigrim û ezê wê bi-
kim xwarin ji me re ! Min lîstik û fenêñ xwe
yê herî dijwar hazir kirîye. Ew nikare vê ca-
rê ji destê min xelasbibe.

Rovî rahişt telîsekî û ew avêt ser bişta xwe.
Gava rovî derket, ji dîya xwe re got:

-Gerek ez wê mirîşkê têxim vî telisi. Yadê,
tu beroşê tije av bike û bide ser êgir, he-
ta ku ez wê tînim bila av bikele.



Rovî berê xwe da pînika mirîşkê û bi dizî xwe gîhand ber pînikê. Rovî xwe veşart û li benda mirîşkê ma. Piştî demekê mirîşk ji pînika xwe derket û li rovîyêfenek hayatı nebû. Wê destpêkir darik ji bo êgir dahev.



Gava mirîşk ji pînika xwe derketibû, derîyê wê vekirî hiştibû. Dema ku paşa mirîşkê ket rovî, vî bi dizî xwe gîhand pînika wê û ket hundurê pînikê.



Mirîşkê karê xwe xelas kir û rahist darikên xwe û berê xwe da pînika xwe. Gava ku ew ket pînikê û derî girt, dît ku rovîyê fenek di pînika wê de ye. Mirîşka belengaz gelekî tirsiya, darikên xwe avêt û şerekî dijwar di nabêna wê û rovî de destpêkir.



Di nav her du resman de 5 tişt ne wek hevin
Ma hun dikarin wan bibinin ?



HEY LÊ KAL 22

Allegro


Hey lê kal. hey lê kal. hey lê ka - lo, ka - li - ko.
E - vi - ka - lí - ci di - kir? Çerx ü çer - kez xwe - di - kir,
Di - ra - né - fi - zî çê - kir, be' - sa - ze - na - cê di - kir,
Hey lê kal. hey lê kal, hey lê ka - lo, ka - li - ko.

Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko.
Evi kali ci dikir? Çerx ü çerkez xwedikir,
Diranê fizî çekir, be'sa zewacô dikir.
Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko.

Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko,
Nevê kale Eminé, bavê lê kur t'emine,
Çar-pênc b'ev girtine, du-sê b'ev berdayine.
Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko


Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko,
E'mrê kalê nod sale, kalê t'irê si sale.
Evi kali ci dikir? Çerx ü çerkez xwedikir.
Hey lê kal, hey lê kal, hey lê kalo, kaliko.

NAVÉ VAN HEYWANAN LÍ BÍNÉ WAN BÍNIVÍSÍN



.....

.....



.....

.....



.....

.....

EZ NİZANİM Çİ BÊJİM

Heval, ez bildirvanim
Dengê saza hozanim
Ji we ez dilgiranim
Ez nizanim çi bêjim

Ez bilûra Marksım
Dengê rista bêkesim
Ji hêvîyan avisim
Ez nizanim çi bêjim

Ez daxwaza Xanî me
Rewşa neqşê Manî me
Di ristê de kanî me
Ez nizanim çi bêjim

Arê dilê Cizîrî
Tava tora Herîrî
Ez nûjenim bi pîri
Ez nizanim çi bêjim

Nakin dengê saza min
Guh nadîn awaza min
Yan nizanîn raza min
Ez nizanim çi bêjim

Ez Mûsayê Hesarim
Ji we tevan dilsarim
Lê ez bi we nikarim
Ez nizanim çi bêjim

Çıman hemî nabin yek
Leşker nakin lek bi lek
Kanîn ew bircêñ belek
Ez nizanim çi bêjim

Hirç ketine nava rez
Gur ji hawîr têne pez
Ji xew rabin em bi lez
Ez nizanim çi bêjim

Çine ev êl û eşir ?
Ne beg maye nejî mir
Ji dijmin re bûn gizir
Ez nizanim çi bêjim

Şexên bi cibe û şas
Xwe ji olê dane paş
Hemî bûne gornebaş
Ez nizanim çi bêjim

Cigerxîn

WAN HEJMARAN YEKO-YEKO BIGIHININ HEV



QUNCIKA DÎROKA EDEBYATA KURDÎ

MELEYÊ CIZÎRÎ

Meleyê Cizîrî, eslê wî ji Cizîrê ye, Cizîra Botan. Navê wî Şêx Ehmede. Di derheqa tarîxa bûyin û mirina wî, tarîxên cûre-cûre tê gotin. Gorî Alêksandir Jaba nivîsiye: "Meleyê Cizîrî, di tarixa pêncsed û çila da (19-45-6) di nîva Cizîrê de peyda bûye."

Di tarîxa pêncsed û pêncî şeş merhum bûye (1160-1161). Gorî wan malûmatan, Meleyê Cizîrî şanzde salan jîye. Bê gûman, ne wusane.

Edebyatnasên kurd Aladîn Sicadî di pirtûka xwe "Mejûy edebê kurd" da nivîsiye, ku "Meleyê Cizîrî di sala 1407-da hatiye dunyayê, di sala 1481-da mirî ye." Ingîlîsê kurdnas D.N. Makenzî dinivîse, ku meleyê Cizîrî li nav salên 1570-1640 da jîye.

Wezîrê Nadîrî dinivîse, ku "Meleyê Cizîrî di sala 1101 hatiye dunyayê û dî sala 1169 mirî ye.

Qanatê Kurdo, fikra Wezîrê Nadîrî a herî nêzîkî rastiyê qebûl dike.


Wezîrê Nadîrî dinîvîse, ku "Meleyê Cizîrî ji eşireta Hesenîyê êzdiya ne, denbêj û şayîrê Mîr Omed-dîn bûye. Ew mîr kurê Eksanqere ji eşîra Bohtan bûye. Xelkê ji Melera di got: "Şêxê Cizîrê", Reysel-şuara" yanî serokê Şayîran."

"Li pêşîyê ew şayîrê azad bû,ewî bona leze-ta xwe,k'êfa xwe straye,lûvandîye û şêrêd derheqa reng û rûyê tebiyetê,evîniye û şerabê da nivîsîne.Paşî,çaxa dilê wî k'etîye qîza Mîr Omed-dîn,ewî şêrêd hezkirina xwe û wê nivîsîne.Mîr Omed-dîn pê hesyaye, ku dilê Mele ketîye qîza wî,Mîr dixwaze bizan-be bi rastî ew ji qîza wî hiz dike,ew dibêje:"Ez qîza xwe didik te" Mele dibêje;"Ez xulamê teme,ez naxwazim." Mîr dibêje:"Şêx Ahmed dersdarê me ye." Wezîrê Nadîrî şiro dike çima Meleyê Cizîrî nexwest qîza Omed-dîn bistîne.Ew dibêje:"Eşîra Botan çûbû ser dînê muslimana,lema Meleyê Cizîrî nexwest qîza Omed-dîn bistîne." Ew ji qîza wî re dibêje:"Tirkên te ruh û dilê min talan di-kin." Wezîrê Nadîrî dinivîse,"di wextê Meleyê Cizîrîde yek pencaneke para kurdan dî-nê êzdîyan dihebandin,di vextê wî da şêx û pîrêd kurdêd musliman qedexe kiribûn,ku xelqê reat kitêbêd dîn nexûnin û mijûlî xwendin û nivîsandinê nebin."




Wezîrê Nadîrî dinivîse,ku "meleyê Cizîrî merivekî gelek xwendewer,bûye,şareza û zana bûye,pisporê edebyeta ereban,farsan bûye.Ewî li Bexdadê xwendîbû,nivîsarên ni-vîskarên ereban,farsan yê dînnasîyê,fîlo-sofiyê,stîrnasîyê û tebiyenasîyê xwendibû "

(Dumahîk heye)

Ma hun dikarin alîkarîya vê devê bikin,ku
Xwe bighîne mezelê Firewn (piramîd) ?



NAVEN WAN TIŞTANAN Lİ BINE WAN BİNİVİSİN



3



PEYVÊN PEŞÎYAN

1 "Nabêñ kî kir, dibêñ kî go!"

2 "Ga dimirî çerm dimînî, mîr dimîrî
nav dimînî!"

3 "Tilîya ku şerîet jêkî jê xwîn nayê"

4 "Sibe tê, xêr pê ra tê!"

5 "Nan padîşah, goşt wezîr, wayê dinan
kizîr-mizîr"

6 "Pêşîya Royê nayê girtin!"

7 "Dinya sîya daran e!"

8 "Silav li mîyan e, ne li rîyan e!"

9 "Derdê dilan hûr i, kûr i, dûr i!"

10 "Xelkê ra masîyan digirî, ji xwe
ra kûsîyan digirî."

11 "Dilê bixezeb nagîje miradan" e.

QUNCIKA BAJAREN KURDISTANÊ

ADIYAMAN

NAV : Navê kevn Vadileman e.Di dema emperatorîya Emewî ya serleskerek yê Emewî ya bi navê Hisnî Mansûr bajar fetih kir û navê xwe lê kir.Ew nav heta 1923'a hat bikaranîn.Lê di nav gelde Vadileman di hat gotin.Meclîsa Tirka 1923'de navê wê kirin "ADİYAMAN".

DİROK:

Li gor lêkolînên ku li der dora Adiyeman'e çêbûne;ew bajarekî gelek kevnare.Berîya ku nivîsandin li cîhanê bê dîtin,merov li wir jîyane. Emperatorî û dewletên ku Adiyeman kirine bin destê xwe evin:Emperatorîya Hîtîtan,Mîttanîyan,Urartûyan,Babîliyan,Asûriyan , Medyan û Farisîyan.

Berî çêbûna îsa di sala 69'ande bi navê Patîşahi Kommaganê patîşahîyek hat dameziran-din.Wê patîşahîyê 141 salan domkir.Heykelên çiyayê Nemrûd,ê wan patîşahane. Bi dû wêde, derdora Adiyemanê jî,wek hemû deverên Kurdistanê buye qada şer di navbêra Ereb û Bîzansîya de.Piştî ku Turk ketin Kurdistanê jî şer her domkir.Bajar demeke kin di destê Emewîya de ma.Adiyeman û derdora wê di sala 1514 de bi temamî kete bin destê Osmanîyan.

CİH :


Adiyeman li rojavayê Kurdistanê ye.Li roj -

Rêyên makîna

Rêya trêne

Qeze

Nahîye





hilatê wê Diyarbekir, li başûrê wê Ruha (Urfa) û Entep, rojavayê wê Meraş û li bakurê wê Meletê heye.

40.000 mirov Li Adiyemanê rûdinin. 7 qeze û 85 gündên Adiyemanê hene. Navê qezayênen wê evin: BESNÎ, KAHTA, ÇELIKHAN, GERGER, GÖLBAŞI, û SAMSAT in.

ÇİYAYE û GEM :

Bakûrê bajêr bi temamî çiyane. Başûrê bajêr heta Ferêt deşte û şînkayî ye. Çiyayênen herî bilind evin: Ak dağ (Çiyayê Sipî-2700 m.), Ulu baba (2500 m), Çiyayê Recep (2300 m) û çiyayê bi nav û deng Nemrûd (2100 m).

Çemê herî mezin û dirêj; Ferate, Gök su, Sofnaz, Egim, Ziyaret û çemê Kehtayê ye.

Hewa :

Li başûrê bajêr hewaya bahra sipî tê dîtin: Gelek baran dibare, berf gelek kêm tê. Ji ber baran tê û çem gelekin, daristan jî pirin. Hinek caran dereca germê dikeve bin sifre. Meha herî germ Tirmehê.

ÇANDINÎ :

Bakurê bajêr bi temamî daristanin. Daristan % 17 e axê digrin. Ev li gor bajarê din ê Kurdistanê jimarek pir bilinde.

Mirovên Adiyemanê bi piranî çandinîyê dikin. Merov dikare bêje Adiyeman Embara genim, ceh, nîsk û hw...e. Ji hemû beşan fêkî hene. E gelek tê naskirin fistiqê Entabê ye. Dim-

Di vî resmî de, solek, şeytanokek, masiyak,
telefonek, firçak û seetek hatîye veşar-
tin. Ma hun dikarin wan bibînin ?



KOÇA ÇÜKAN

Di vê derheqê de merov dikare çûkan bike
sê beşan:

a- Çûkên ku cî û warêن(hêlinêن) xwe naguhe-
rin.

b- Çûkên li der dorê nêzîk digerin û dîsa
vedigerin cî yê xwe.

c- Çûkên koç dikan.


Welatêن çûkan,cî yê ku lê hêka dikan.Lê ji
ber sermê,germê ûçareserkirina êm hinek çûk
koçî cî yê din dikan.

Hinek çûk yek bi yek û hinek jî ref bi ref
koç dikan. Legleg,qazê bejî,ordekê bejî û
qulung ref bi ref ji derekê koçî derek din
dikan.Piranî,gava çûk ji derekê koçî dere-
kê dikan,di yek rîyê difirin û di wê rîyê
jî vedigerin.


Hinek çûk seranserî derya difirin,hinek di
newal û gelîyan de,hinek jî seranserî çîyan
difirin koçî cê xwe dikan.

Koçkirin,ji Ewropa li ser du rîyan dest pê
dike:

Rîya yekem; ji İskandînavya,Fînlandîya,Sov-
yet,Almanya Rohîlat,Avustirya,Macarîstan ber
bi başûr dadikeve di ser Türkiye û Kurdîs-
tan re derbas dibe.Çûkên li Turkiyê û Kur-
distanê jî tev refan dibin û di ser Sûri re
difirin û berê xwe didin çemê Nîl û başûra



Legleg bi refên mezin ji alî başûr koçî alî
bakur dikin.Li wêderê hêlinêن xwe çedîkin û
dûre hêka dikin û kurk dikevin.




Afrîka, cî yê xwe ê zivistanî.

Rêya dudan; ji Îskandînavya vediqete, di ser Almanya rojava, Fransa, İspanya û Cebelî-tariq derbas dibe û xwe dignîne başûrê Afrîka.

Ji bo çûk xwe bighînin hêlînên xwe yên zivistanî, bi rojan û mehan dibê bifirin. Mesela; Hechecîkê bahrê, ji Kutba Bakur ta Kutba Başûr di şes mehan dighêje. Legleg havîni li welatêن jorî Ekwatorê dîmînin û zivistanî jî koçî welatêن jêrî Ekwatorê dikin. Hinek çûk 30.000 kîlometre rê difirin, gava koç dikin. Ordeka bejî seetê 80 km, Hechecîk 120 km û Teyrikê awê 60 km dikarin bifirin.



NAVÊ VAN FEKİ Ü ŞÎNKAYAN LI BÎNE WAN BINIVÎSIN






$$\begin{array}{l} 6+3+5= \dots \\ 2+3+9= \dots \\ 4+5+7= \dots \\ 2+8+3= \dots \\ 6+2+5= \dots \\ 8+1+4= \dots \\ 2+1+9= \dots \\ 5+3+8= \dots \\ 8+8+8= \dots \\ 6+5+7= \dots \end{array}$$

$$\begin{array}{l} 2+3+5= \dots \\ 6+8+7= \dots \\ 9+8+9= \dots \\ 6+5+3= \dots \\ 8+8+2= \dots \\ 0+0+0= \dots \\ 6+3+4= \dots \\ 5+9+3= \dots \\ 6+7+8= \dots \\ 2+8+9= \dots \end{array}$$

$$\begin{array}{l} 6+9+3= \dots \\ 2+4+8= \dots \\ 2+8+4= \dots \\ 4+2+8= \dots \\ 8+4+2= \dots \\ 7+8+7= \dots \\ 3+9+7= \dots \\ 6+8+9= \dots \\ 5+5+5= \dots \\ 6+5+4= \dots \end{array}$$



Q U N C I K A P È Z A N Î N È

Pirs: 1

Şeşê reş, şeşê belek
Du boxin, donzdeh çêlek,
Ew çîye ?
Bersîv:.....

Pirs: 2

Av dinyayê têr dike,
Çi avê têr dike ?
Bersîv:.....






Pirs: 3

Kofîya xezalê,
Hol bû newalê,
Ew çîye ?
Bersîv:.....

Pirs: 4

Kerî kete ser stêr.
Ew çîye ?
Bersîv:.....

X A Ç E P I R S



6

32

Q Ü N C I K A P È Z A N İ N È

Pirs: 1

Sêsid û şêst reşêle,
Dozdeh ga û du çêlek,
Nêvî reş,nevî belek,
Ew çîye ?

Bersîv: Sal,meh ,roj
û şev

Pirs: 2

Ew kî ye ?
Ku mehê carekê kal dibe,
dimre û dîsa dizê.

Bersîv: Hêv

Pirs: 3

Hildikşim ser zinara
Lêdixim,deng diçe hezara,
Ew çîye ?

Bersîv: Brûsk

Pirs: 4

Tişkî min heye,
Bê ruhe,lê dimeşe.
Ew çîye ?

Bersîv: Sîya merov

XAÇEPIRS

1→	D	E	R	Z	İ	
	2↓					
3→	B	E	R	A	Z	
4→	E			P	E	L
5→	R	Ê	W	İ		
6→	C	Ü	K			
7→	A	L				
8→	V		G	Ê	Z	E R
9→	K	E	V	C İ		



1



2




3



8




5




7



4



9



KEREKÎ ME HEBÛ Û KUNDURKÎ ME

KERÊ ME KUNDURÊ ME KOT KOT KOT,

ME JÎ ÇIROK Û MESELÊN XWE

YÊN VÊ HIJMARÊ JI WERÊ GOT

KULILK



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA